

DÎHNÊN XWEZAYÊ YÊN HEEBUNÊ

-3-

«menfeetperestî»

Žiber menfeetên xwa yê sexsî meriv timî dixwaze ku kesên din bi tevayî adil tevbigerrin, žibo ku ew bi xwa bikare ži tevgerrîna wan ya adil bi tevgerrîna xwa ya bê adil hertim kaarê bike.

(07.08.2012, 21:30, Zürich)

Xweza bi xwa «menfeetên adil u ne adil» nas nake, žiber ku di xwezayê da «adilî u ne adilî» tun e, tenê «yê/ya serketî» hee ye.

Loma, bi çî hawî dibe bila bibe, žibo mayîna xwa ya li žiyanê «menfeetperestî mafekî xwezayî yê herî bingeîn, meşru u rewâ» ye.

Ev menfeetperestiya takekesî u komî ya žîndaran dibe sebeb ku di nav xwezayê da žiyan bihafire.

Di nav her însanî da daxwaza ku kesê/a din bi maf/adil tevbigerre, hee ye. Tevî ku ev yek wekî prensîp daxwazeke her însanî ye žî, ti kes u žîndarê ku bikare ligorî vê hoyê tevbigerre žî, nî ye, u nikare hee bibe žî. Xweza ne li ser «daxwazên [kes u] žîndaran», lê li ser «menfeetên heebunê yê žîndaran» pêk hatiye.

Xweza bi xwa ži elementên herî piçuk heta yê herî mezin li ser du prensîban ava buye: «kanî» u «nekanî». Yê u ya ku «dikane menfeetên xwa biparêze, dimîne».

Lê yê u ya ku «nikane menfeetên xwa biparêze» žî, «namîne».

Tabî mayîna yê u ya ku «dikane», bi nemana yê u ya ku «nikane» va girêdayî ye.

Yanî žibo ku yek bikare bimîne, nemana yê u ya din zerurî ye.

Bêguman hemî zmanên heeyî žî ligorî vê berbirka/zagona xwezayî dižin u dimirin.

Mesela žibo ku zmanê tirkî, farsî u erebî bikarin heebuna xwa pêt bikin, li žiyanê bimînin u belav bibin, tunebuna zmanê kurdî u zmanên din mecburî ye.

Žiber vê hindê ye ku di nav milletê kurd da «meşrukirina» zmanê tirkî, erebî u farsî, bi destê xwa kuştina zmanê kurdî ye.

Wezîfeya kurdan ya herî sereke u ya heebunê, di nav milletê kurd u xelkên din da belavkirina menfeetperestiya zmanê kurdî ye, u redda zmanên dižminan u zmanên din yê bi gef in.

Li ba tirk, ereb u farsan zmanên ži derî kurdî yê wekî înglîzî, frensî, elmenî, îtelî, spenî, hîndî, rusî u hwd. serbest in, bi van zmanan dibistan dersan didin, žiber ku ti gefa/biveya van zmanan ya dîrekt žibo tirkî, erebî u farsî tun e.

Lê heman toleransê ti carî žibo zmanê kurdî nîsan nadin u nikarin bidin žî, žiber ku zmanê ku dikare di nav heman «çîgeha žiyanê» da çî li zmanê tirk, ereb u farsan teng bike, wan hezar bixîne, ew žî zmanê kurdî yê di tenîsta wan da ye.

Neteweya ku hemî derfetên xwa yê heeyî di ber menfeetperestiya xwa ra naxîne nav tevgerrê, hew dikare heebuna xwa di nav xwezayê da pê bike.

Bêguman ligorî her heyamê pergalên ku zîbo vê yekê tên bi kar hanîn, dikarin biguherin yan zî bi tevî teşeya xwa ya nu zî nu va werin orxenîze kirin, mesela wekî dîn, bawerî, bîra kesî u komî, îdeolojî, siyaset, ekonomî, welat (dewlet), rewîst, tore, pêwendî, helbest, pîşe, huner (muzîk, şano, sîneme, resamî, reqs, mîmarî, ...), sport, xwandin (-a bi zmanê dayikê), perwerdeya netewî, medya, malbat, zanyarî, mîsogerî, teşe u hoyên tevgerrîne, henek, nivîskarî, ...

Tevda zî «pergalên zîbo menfeetperestiyê» ne u loma zî tenê u tenê zîbo vê yekê hee ne.